Dumahk: Tirs û çavsoriya.....

(Ber û Hevbendiyê) , karîbûn bi hevre kongirekî xwe lidarxin , û di bin navê Encûmena Nişţîmanî ya Piletforma (Danezana Şamê – Îlan Dîmeşq) xwediya dirûşma: Ji bo pêkanîna guhartina demokratîk a aştiyan de , li ser hinde belge rawestin û erê bikin . Herweha kongirê karîbû pirograma karûbarê xwe bi serkeftî bibira serî û rêvebiriyek ji xwe re helbijarta .

Hêjayî gotinê ye ku endamên kongirê ji hemî parêzgehên Sûriyê hebûn , vêca ji bilî , Heleb , Şam , Latqiyê , Hums û Hemayê , ji Swêda û Der'a de bigir ta tu bighê Reqê , Dêrazorê û Hesekê…hwd.

Li hêla dî, di civata Encûmenê de , bi dehan camêr hebûn , yên ku her yekî ji wan , bi neheqî bêtirî 10-15 salan ji jiyana xwe di zîndanan de , di paş deriyên hesinî de borandibûn , ji ber ku ew xwedî bawerî û nêrîn bûn , azadîxwaz û mirovhez bûn , siyaseta parta Be'is ya tek-partiyê nedipejirandin , ji şêweyên kuştin û xwînrijandinê re digotin **na** .

Bi dawîbûna kongirê re , li seranserî Sûriyê û li derve baş deng pê diket , û ev gava he dibû ciyê pesin û pîrozbahiyan . Vêca piropagandayeke xurt digel giraniyeke rêxistinî , siyasî , rengane , lihev û pirnas dihate holê û li hundir Sûriyê rê li ber xebateke berfirehtir vedibû . Lewre jî karbidestên rijîma parta Be'is , sergerm û çavsor dibûn , dest bi girtinan dikirin , da ku – xwedê giravî – karibin rê li ber liv û tevgera siyasî a demokratîk û aştiyane bigirin û devê wê bixetimînin.

Zor mixwabin ku ta niha , rê li ber rêxistinên mirovane an xwediyên wan girtiyan venebûye ku karibin wan carekê bibînin , lewre jî dixuyê ku tirseke ecêb ketiye zikê karbidestan , dilteng bûne û hurve wirve tevdîran distînin .

Careka dî jî xuya dibe ku ew nikarin guhdarî nêrîneke dî ya cuda bikin , ji gotûbêj û diyalogê re , ne amede ne , nejî pê bawerin .Û bi serde jî , bi her hawî hewil didin ku dengê hemwelatiyan û Îlan Dîmeşq bête birîn , û rola wê ya erênî û avaker di jiyan û pêvajoya civaka Sûrî de biçelmise û bête tunekirin .

Roj ji rojê baştir xuya dibe ku ev lihevkirin û piletforma Îlan Dîmeşq , çerçewake nişţîmanî Sûrî demokratîk û mirovhez e , hembêza wê mezin û berfireh e , lewre jî hemî rengên civakê bi dostanî û biratî ciyê xwe tê de dibînin , çi kurd , Aşorî û Ereb , Fille , Misilmanên Sunî , yên Elewî , Isma'ilî û Durzî …HW.D. Loma jî ev pêla girtinan û tevdîrên tund li dijî liv û hebûna Îlan Dîmeşq li ba piraniya xelkê Sûrî ciyê nerazîbûn û şermezariyeke xurt bû . Daxwaza hemiyan ewe ku girtiyên siyasî û xwedî nêrîn , rojekê pêşde ji girtîgehan bêne berdan û rûpeleke nû di jiyana Sûriyê de vebe , da ku mirov wêribe û karibe bê tirs nêrîna xwe bêje û azad be.

Sînorê Yekta